


zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



Sal:1985



ZAROK FÊKIYÊN MALAN E

Şêrîn e welatê me

Şêrîn e welatê me
Zêrîn e zemîna me
Dehl û kanî û av e
Bihar reng e her gav e

Şêrîn e welatê me
Axa bav û kalê me

Bîr bibin ne bîr bira
Welat mijtin van gura
Ava kirin mal û gund
Girav kirin ruwê rind

Şêrîn e welatê me
Axa bav û kalê me

Şîn û jîn nabe gul
Ger tu av nedî ji dil
Xweşî bê tehlî nîne
Nexta welat her xwîn e

Şêrîn e welatê me
Axa bav û kalê me

Ey zana û xwendevan
Ey xort û keçen ciwan
Tev karker û cotkaran
Bikin qîr û hewara

Ey zana û xwendeyan
Hûn rêberê Kurdistan

DURUST/Sûrî



XALÊ BRO

Xalê min Bro zilamekî çeleng û jîr bû.Jiyana xwe tev di şivanî û gavantiyê de derbas kiri bû,îcar hingî tişt hatibûn serê wî jê re digotin"Broyê serpê-hatî!"

Ciwata ku ew tê de biwa çit ji kesî dernesidiket,teva guhdariya wî dikir.Temenê(emrê)wî 55 sal bû lê dilê wî hê dilê xortan bû û bi xortan re geleki rûdinişt.Xorta jî ji xalê Bro gelekî hez dikir û guhdariya wî dikirin,ji ber ku wî zanî bû bi zimanê xortan bi-axive.

Çîroka wî ya xweş wexta ku,qala xwe û dostika xwe ya Ereb ku li beriyê bû dikir.Lê wî tucar ji bîr ne dikir ku qala mîraniya xwe bike.Dema ew di serpêhatiyên xwe de germ dibû,qayîşa xwe ji nava xwe vedikir,dikir qulp dixist lingê xwe û bi destâ qayîş dikşand hetta ku ew biqetanda.Ma hew ev bi tenê bû ? belê wî şerîtên dewlîn gelek pî-rekan jî qetandi bûn.Ew gelek caran diçû ser bîra avê û pesnê xwe ji pîrekan re dida.



Pîrek jî pê dikenîn û digotin "maşeh, hê xalê me Bro xort e." Xalê Bro jî ji bo xortaniya xwe nîşan bide şerîtên pîrekan li destê xwe digerand û digot "qurp" û dijetandin. Rebenê pîrekan dilê wan li ser şerîtên wan diêşîyan. Lê dawî ji çîrokêñ ber tenûran me bihîst ku, xalê Bro dil ketiye cîrana xwe.

Dibêjin carekê rezekî xalê Bro hebû, zebeş û petêxên wî pir bûn û nav û deng dabûn. Lê kîroşkan gelek zebeş û petêxên wî dixwarin. Xefkek wîyî bi nav û deng hebû, wî gelek kîroşk bi wê xefkê girti bûn.

Demekê gotinek li nava gund belav bû û hat gotin "wele roviyek tê nava rezê xalê Bro, lê ew dike û nake nikare wî bigire."

Rojek ji rojan weke hertim şeveqê xalê Bro diçê nava rezê xwe. Xalê Bro carekê dît ku, wa rovî ketiye xefkê û ew li erdê rast bûye. Xalê Bro serê xwe hejand û got "Hey mîrato tu ketî nav lepê min, ezê heta bi hestiyêñ te bixwim".



Xalê Bro heta jê hat darek li newqa rovî xist. Lê deng ji rovî nehat. Xalê Bro ma ecêb mayî "waxxxxx..lawo ev mîrat xeniqiye". Xalê Bro li ser sekinî, li dora wî çû û hat lê deng û his ji rovî nehat. Xalê Bro destê xwe avêt xefkê û ew jê derxist. Çaxa wî kir ku, rovî ba-vêje dît ku dilê rovî çawa hildavê. Xalê Bro hema hişk bi qirikê girt. Çaxa wî bi qirika rovî girt hema rovî hişk bi tiliya wî girt û dev lê kirê. Dira-nên rovî yên jor û jêr di tiliya xalê Bro de gihan hev. Qar qara xalê Bro di ezmana re derket. Xalê Bro bi destê din bi tepa bi nav serê rovî ket.

Rovî wexta dît ku, xalê Bro ew berda hema ji nişkê ve bazda. Qederê sed ga-vî çû li xalê Bro zîvirî û li ser qû-na xwe rûnişt.

Li gor gotina xalê Bro, rovî destê xwe bi dilovanî ji xalê Bro re hejand piştre berê xwe da çiyê û çû

KAWA

/Bûlgarîstan

* * *

KURDINO DE BES E RABIN

Kurdino de bes e rabin
Li meydana şer weke şêra bin
Ji bo Kurdistanek serbixwe can feda bin
Bila tîrbêñ(gor) we jî li nav yên şehîdan bin

Parçe kîrin welatê me
Ereb, Ecem û Tirkân
Zincîr dijetandin bav û kalêñ we
Dijmin iro hûn bi tayêñ xav girêdan
Di malêñ xwe de hûn weke keftar in
Li meydanê hûn pir şerkar in
Kurdistana we bi çiya û zinar in
Lê belê iro hûn ker û lal in

Fedî mekin ji bo ku, hûn Kurd in
Navê Kurd mezine lê nezan zigurd in
Ev fen yên dijmin in ji bo nehiştina we
Lê ez çi bikim nakeve serê we

Tucar dijmin bi xweşî nade we
Ku ne hûn bistînin bi zora çoyê xwe
Ku dijmin bide we ji we nastîne
Petrol û hesin, zîv û zêrê we

M A L W E R A N




ÇİROKA "XÊR Ü ŞER"

Ev çîrok ku, helbestvanê Rohilatê yê bi nav û deng NÎZAMÊ GENCEWÎ nivîsiye, li bajarê Sowyetîstanê BAKÛ yê bi zimanê Rûsî derketiye. Ev çîrok di nava Kurdan de belav bûye. Kifş dibe ku, NÎZAMÎ jî ji Kurdanbihîstiye.

Dibêjin: "Di dewranekî de du bra hebûn. Navê yekî Xêr û navê yê dinê jî Şer bûye. Kar û kîrinên wan jî li gorî navê wana bûye. Yê mezin xortekî rem, qenc û xêrxwaz bûye, lê yê piçûk xortekî bêbext, beter û xêrnexwaz bûye.

Çawa dibe ew cî û meskenê xwe dihêlin û diçin wenatekî dûr. Xêr bi xwe re nan û Şer jî avê hildide. Ew herdû bra li rex çemên avê û di nava xwezayî (tebiyet) yê de dimeşin, geh nan dixwin geh mijûl dibin û berdewamî riya xwe dikin. Brê piçûk qet kada avê nake, wekî zane ku, riya wana di gelî û kendalên bê av re derbas dibe, ava xwe di nava hebanê de vedişêre, carna bi dizî vedixwe, lê avê nadî brayê xwe yê mezin.

Di heft şev û heft rojan de riya xwe diqedînin. Dev û lêvê Xêr ji tîbûna teriki bûn, lê Şer av ne didayê. Xêr ji neçarî du kevirên giranbiha ji bêrîka xwe derdixe nîşanî brê xwe dide da ku ew niqutek av bidê.



Lê Şer bê újdan û bêbext bû,ewî got:

-Tu nikarî min bixapînî,tu dixwazî wan keviran bidî min û avê vexwî,paşê bi darê zorê ji min bistînî.Gerek tu ronaya çavêن xwe bidî min.

Xêr ji vê bêbextiyê destgirtî dimîne,lê ji tîbûna dilê wî hatibû ber devê wî.Bi vê nevê Şer herdû çavêن wî derdixe û avê ji nadê.Xêr li wê bestê tiki tenê dimîne,xwe davêje erdê,ji êşa çavêن xwe mîna teyrekî baz li erdê diperpite û xwîna sor ji çavêن wî dihereke.

Wî çaxî Kurdeki koçer keriyê pezê xwe diçêrand.Keçeke wî ya kezîzer,gulîdirêj,bi xalên deq-deqî,çavbelek,sûrethinârî hebû ku,mîna xaşxaşka çolê bû.Ew keç ku,çêrê xwe hilda-bû milê xwe û ber bi kaniyê ve diçû da ku avê ji bavê xwe re bîne,li dengê xortê nnas hay bû.Çaxa dota Kurdan çav li Xêrê belengaz dikeve,tevzînok bi canê wê dikevin.

Xêr yeko yeko serpêhatiya xwe ji dota Kurdan re dibêje û giliyê xwe dike.Keça Kurdan cêrê avê li ber datîne,çavêن wî yêن ku,di nava xwînê de mabûn û daliqiyabûn,dişo,dike cî û dipêçe.

Keça Kurdan ya mîrxas bi vî awayî alî Xêr dike û serpêhatiya xwe ji diya xwe re dibêje.



Paşê xort tînin mal,bi nan û av dikin Bavê qîzê Kurdeki kal bû,çaxa çav li xort dikeve ji jina xwe û qîza xwe re dibêje ku, çend pelên dara palûtê bînin,jê gulavê çêkin û pê çavêن xort bişon.Çendeki şûnde bînaya çavêن wî têne cî.

Çavêن Xêr yêن agirî dilê dota Kurdan evîndar kir,lê çavêن keça Kurdan yêن bengî û belek jî dilê Xêr sotin.

Xêr her sibe bi rex Kurdê kal diket û alî wî dikir.Ewî jî xebathiziya xort texmîn dikir û baweriya xwe pê tanî.Hezkirina dota Kurdan,Xêr xemgîn kiribû.Xêr dihizirî û xwe bi xwe digot:"Ez kesîbe ji mala kesîba me, lê ew dota dewletiya ye.A rind ev e ku,ez wê bihêlim û biçim welatê xwe"

Carekê berêvarî Xêr ji deştê vedigere û ji malxwê re dibê:

-We ez xelas kirim,ez merivekî biyanî me,we ji bo min gelek tişt kirin ku,merivêن min ne dikirin,bra bi bra re jî nake.Ez deyndarê we me.Heger ez temenê(emrê) xwe jî bidim we cardin ji bin deynê we dernayêm.

Gotinêن Xêr bandorek(tesîr) mezin li Kurdê kal kir,weke ku aveke sar bi ser dabe,di ci-hê xwe de rûsar ma.Ew mala ku,dengê evîn û şahiyê jê kêm ne dibû,demekê qerisi,dilê dota Kurdan jî qusiya.



Malxwê texmîn kir ku,dilê dota Kurdan ketiye Xêr û Xêr jî jê hez dike.Ewî nikarî bû destêñ du dilêñ bengî ji hev bikira.

Berê diket dilê Xêr ku,dota Kurdan ya mîna heyva çardeşevî bibe bermaliya wî.Lê qet bîr ne biri bû ku,kurdê dewletî wê dota xwe bide wî.

Çil roj û çil şeva govenda wan geriya û bi vî awayî ew bi miradê xwe şâ bûn.

Gelê Kurd ku,xwediyê zargotineke dewlemend e,gelek afirandinêñ delal saz kirine qencî û xirabiyen de saz kirine.Ev çîrok afirandineke wisan e ku,qencî xerabiyê bi bin dixe û mîrxasê çîrokê zarokan bi vî giyanî(ruh î) perwerde dike,wekî ku gotî:"çawa ku,li dijî xirabiyê şer dikan,wisa jî tenê tiştêñ qenc bikin!"

Têmûrê Xelîl Mûradov

Êrivan

* * * * *

G U L

Gulê jînek ji darê
Ew e şana bihar ê
Hûr hûr e gulên darê
Ew e gula vê salê

Gul zahir e şerîn e
Ciwan sor û zerîn e
Tim bi dil û evîn e
Bilbil li ser dixwîne

Sê meh salê şîn bûne
Hemû xweşî civîn e
Rengê teva wek xwîn ê
Tim bi ax û zarîn e

RÊNCBER/Bûlgarîstan

* * * * *

PÊKEÑÎN

Kal û xort

Kalekî bi şev û roj nimêj dikir û ji
xwe re digot:"Sedî sed ezê biçim bihuştê":

Xortek jî hebû qet nimêj ne dikir.Ewî
zor dabû kîf û tinaziyên xwe û rojên xwe
bi şanazî diborandin.

Di ser re dem û dewran derbas bûn
rojek hat herdû jî ji vê dinê koç kirin
û çûn dilovaniya xwedê.

Li dinyaya din jî herkes li benda roja
xwe ye.Hinek bi xwe bawer in û dibêñ"ji-
xwe cihê me bihuşt e,emê bibin xwediyyê
heftê horiyan." Û hinek jî bi xwe ne ba-
wer in û ji bo çûna dojehê(cehnemê) xema
dixwin.

Tu nabê li wê dinê jî du şeqil(mohr)
hene.Yek a bihuştê û ya din jî a cehnemê
ye.

Yê xort li wê dinê ji dû yê kal na-
qete,li benda kêsa xwe ye.Yê xort care-
kê nerî ku,wa yê kal hat.Ewî hema bi
dizi çû mohra kalo ya bihuştê ji bêrî-
ka wî derxist û ya xweyî cehnemê xist
bêrîka kalo.



Piştî roja wan hat,notirvan(dergevan) li mohran nerî û yeko yeko ew berdidan cihê wan.Dor hate kalo.Kalo mohra xwe ji bêrîka xwe derxist û bi kêf da dest dergevan.Dergevan çaxa li mohrê nerî hema bi çeplê wî girt û ew avêt nava agir.Kalo her lava kir jî lê fêde ne kir,

Demek di ser re derbas bû,Rojekê yê xort got:"Wele ezê biçim serdana kalo."

Yê xort rabû çû cehnemê.Nerî ku,wa kalo di nava agir deye.


Yê xort ji kalo re got:

-Kalo! tu çawan î,rewşa te çi ye ?


Kalo axînek kişand û got:

-Ax! lawo ax! hema tembiya min li te be,min nimêj kir tu nimêj meke!

BRÎNDAR



LEBATÉN HİNDUR




Armanc û erka lebatan:

Berê xwarin bi diranan tê çûtin
û dikeve şiklê gepa daqurtandinê.
Xwärna ku di lûla xwarinê re derbas
dibe digihê devê aşik ê.Di vê rê-
wîtiyê de xwarin bi tifê şil dibe
û tê guhertin.Pâşê bi alîkariya
hin lebatên din xwarin tev li ava
aşikê dibe.Xwarina ku ji aşika me-
riv derbasî roviyên zirav dibe,li
wir tev li ava roviyên zirav,ava
zirav û ava firşik dibe. Xwarin
êdî şiklê xwe wenda dike û dikeve
şikleki hişk û tarî.Bi vî şiklê
xwe xwarin ji alî hin lebatên din
ve tê mêtin.Bi vê mêtinê ew tev
li xwîna meriv dibe û li laşê me-
riv belav dibe.

Xwarina ku tev li xwîna meriv
nabe û di aşika meriv de dimîne
hêdî hêdî xwe bera roviyên stûr
dide.Piştî wê xwe hêdî hêdî bera
jêr dide û bi riya "ANUS" ê derdi-
keve der.

H E S T İ




H E S T İ

Hestî bingeha laşê meriv tînin
meydanê û gelek lebatêن meriv ji
ziyanê(ji xisarê) diparêzin.
Di qaqilê serî de 22 di gewde de
58 û di ling û milan de 126 hestî
hene.Tevde 206 hestî ne.Hestiyêن
zarokan ji yên merivêن gihiştî
nermtir in û zûtir dişikin.




girêdank movikên nîv lîstî



movikên têن lîstin

hestiyêن nelîsti

X A Ç E P I R S



Çeperast

- 1-Navê jin an keçekê
- 2-Navê bajarekî Kurdistanê
- 3-Cihê ku koçer diçinê... Navê xort an mîrekî (berepaş)
- 4-Çaxa avê an meyê vedixwin tê gotin..tiştekî
ku li ezman heye (berepaş)
- 5-Roja ku em tê de... Kesên ku nabînin
- 6-Dayê....Fermanek ji rabûnê
- 7-Xwarina heywanan...Tiştekî ku meriv germ dike
...serê xanî

Serejêr

- 1-Navê jinekê
- 2-Apo...heywanek (berepaş)
- 3-li hinek ciyan werz dibêjin...noteyek (berepaş)

- 4-Navê kurekî...cihê ku meriv li ser dimeşe (berepaş)
5-Tişteki xwarinê
6-Çaxa di xwarinekê de pir xwê hebe
7-Tiştê ku meriv hildigre (berepaş)
8-Bavo...bûyerek tebîetê
9-Navê keçekê (berepaş)

X X X X X X X X X X X X

X X X X X X X X X X X

X X X X X X X X X

X X X X X X

Bersiva hejmara 18 an

1.limon,tırşok

2.Kumik,kuvark

3.garis

4.Berü

5.Ananas

6.Kelem,lehane

7.Hirmî

8.Gêzer

9.Trî

10.Tivir,tirp

11.Qeresî

12.Mûz

13.Kartol,petat

14.Firingî

15.Zeytûn

16.Şelim

17.Sêv

18.Pirteqal

19.Fasûlı

20.Pîvaz

21.İsot

22.Sîr

23.Zebeş


24.Tehlik

25.Bacanê reş

26.Mışmiş



| | |
|---------------------|--------------|
| Cênik..25 | Ling,paq..26 |
| Çiçik..33 | Zend..39 |
| Qebd....19 | Rû..12 |
| Lêv.....10 | Dest..21 |
| Mil,çeng..18 | Tili..22 |
| Nava dest..20 | Pê,ling..35 |
| Pêşenîk..2 | Navik..36 |
| Serî,ser..1 | Anışk..28 |
| Kêlek,tenişt..23 | Pêçî..27 |
| Rehn,hêt..30 | Pehnî..34 |
| Kabok..32 | Zik..37 |
| Por...3 | Bend..38 |
| Guh..4 | |
| Poz,bêvil..8 | |
| Zengelolk..29 | |
| Sîng..31 | |
| Burh,birû..5 | |
| Mijank..7 | |
| Çav...6 | |
| Gewri..16 | |
| Qirik..15 | |
| Sermil..17 | |
| Çen..13 | |
| Piştä stû,patik..14 | |
| Dev..9 | |
| Anî..11 | |
| Gûzek,gwîzek..24 | |




Naverok

rûpel

| | |
|---------------------------------|-------|
| Zarok fêkiyên malan e..... | 1 |
| Helbels/ Durust..... | 2 |
| Xalê Bro/Kawa..... | 3 |
| Helbest/Malwêran..... | 8 |
| Çirok/Têmûrê Xelîl Mûradov..... | 9 |
| Helbest/Rêncber..... | 16 |
| Pêkenîn/Brîndar..... | 17 |
| Lebatêñ hindur..... | 20 |
| îskelet..... | 22 |
| Xaçepirs..... | 24 |
| Bersiv..... | 26-27 |

www.arsivakurd.org



YAN

KURDISTAN

YAN NEMAN !



UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNİŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr
BIHA